***Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê***
*Kurdistan National Congress*
***Congrès National du Kurdistan***

KNK

***Rue Jean Stas 41, 1060 Bruxelles Tel: 00 32 2 647 30 84 Homepage:*** www.kongrakurdistan.net ***E-Mail:*** kongrakurdistan@gmail.com

# HELWESTNAME

## Helwesta Neteweyî û Niştimanî li Hember Êrîş û Dagirkerîya Dewleta Tirkiyê

**Li ser bang û vexwendina Kongreya Neteweyî ya Kurdistan – KNKê, em nûnerên dehan partî, rêxistin û sazîyên Kurdistanî, ji hemî pîşeyan (meslekan) sedan kesayetên serbixwe (nivîskar, hunermend, ronakbîr, akademîsyen, rojnamevan, siyasetvan, nûnerên pêkhate û dîn û dînza) yên Kurdistanî ku em xwe weke dengê wijdana neteweyî û niştimanî dibînin, jibo helwestgirtin li hember êrîş û dagirkerîya dewleta Tirk, jibo xwedî derketina berxwedana hêzên parastina gelê Kurdistanê, me konferansek berfireh li ser tora “Zoom” ê pêkanî. Em vê banga jêrîn ji reya giştî re pêşkêş dikin.**

Dewleta Tirkîyê di roja 24.04.2021an de, li başûrê Kurdistanê li deverên Metîna, Zap û Avaşîn, operasyonek berfireh da despêkirin. Niha li van herêman, şerên giran rû didin. Hêzên Gerîla bi qehrenaî û fedakarîyek mezin berxwe didin. Ev êrîşên mezin ne tenê dijê hêzên HPGê ne, dijê hemî deskevtên Kurda ne û teybetî jî dagîrkirina başûrê Kurdistanê ye. 24ê Nîsanê salvegera fermana (jenasid) dijê gelê Ermenî ye. Despêkirina opersayonê di vê rojê de, ne tesadûfe. Peyam vekirîye û peyama jenosîdê ye.

Armanca wan ji alîyê me ve kivş e. Dewleta Tirk dixwaze Kurd û hemî pêkhateyên Kurdistanê (Asûrî-Suryanî-Kildanî û yên din) li ser axa xwe azad nebin, dîl bin û welatê wan jî dagîrkirî be. Dewleta Tirk, netewevebûna Tirkî, li ser tûnekirina gelên din ava dike.

Dewleta Tirk dijî hebûna Kurda ye, dijî Kurdistanê ye. Vê niyeta xwe venaşêre, bi kiryarên xwe yên çandî, siyasî û leşkerî nîşan dide. Dewleta Tirk di êrîş û operasyonên xwe de, bi niyeteke xirab û plankirî, demografî û jingeha (ekoloji) Kurdistanê, hedef digre û xirab dike.

Dewleta Tirkiyê sala 2017an de, di êrişa Eraq ê ya li ser Kerkûk, Xurmatû, Xaniqîn, Şingal û navçeyên din yên dabirayî da, piştevanîya hukumeta Bexdayê kir.

Di êriş û dagîrkerîya DAIŞê ya li ser Kurdistanê û bi taybetî êrîşa Kobanê da, dewleta Tirk xwedî roleke sereke bû û hevkarîya DAIŞê dikir.

Dewleta Tirk, dijî Kantonên Rojavayê Kurdistanê û rêveberîya xweser ya Bakur-Rojhilatê Sûrîye yê, ji sêrîde û heta niha, di pozisyoneke êrişkar da ye. Herweha li başûrê Kurdistanê jî dehan baregehên leşkerî û sîxurî danîne û wan baregehan dijê deskeftîyên gelê me kar tîne.

Niha jî li devera Metîna, Zap û Avaşîn, dest bi êrîşeke mezin kirîye. Li hember vê operasyona mezin heta niha, di asta neteweyî û navneteweyî de, weke tê xwestin deng bilind nebûne û bertek kêmin. Pêwîste ev bê dengî, bê şkênandin û li hember dagirkerîyê bertekên mezin derkevin holê. Divê hêzên berxwedêr, helwest û hevkarîya me, li gel xwe bibînin. Bi yekîtîyek xurt û bi piştgirîya dostan, em dikarin van êrîşan têkbibin. Dewleta Tirk ne ewqas xurt e, mînaka serkevtina Gare yê li ber çava ye. Bi berxwedanekî neteweyî, em dikarin hêza wan têkbibin.

Di sêrî de, divê helwestekî neteweyî û niştimanî derkevi holê. Ji bo vê jî divê hemî hêzên Kurdistanî, li dijê dagirkerîyê xwedî helwestbin û di asta herî bilind da, zirxekî parastinê yê neteweyî û niştimanî li dora berxwedêran vehûnin. Helwesta yekgirtî dikare bêdengîya aktorên sîyasî yên navdewletî jî biguhere.

**Şêwira Helwesta Neteweyî ya Dijê Dagirkerîya Dewleta Tirk, bi giringî û lezgîn vê bangê dide gelên Kurdistanê û Cihana humanîter û demokratîk:**

1. Di salvegera (24.05.2021) jenosîda dijê gelê Ermenî de, êrîşkirina başûrê Kurdistanê, peyama dubarekirina jenosîdê ye. Ew dixwazin gelê Kurd jî, bi jenosîdê re derbaz bikin. Em beşdarên Civînê, li ser vê helwesta hovane ya dewleta Tirk bi hesasî nîzing dibin, bi hemî imkanên xwe dijê vê êrîşê radiwestin û li gel hêzên parastinê cihê xwe digirin.
2. Bêtifaqîya navxweyî ya Kurdistanîyan, çeperê parastina destkevtên Kurdistanê lawaz dike û rê li ber cepheyê dijminan xweş dike. Ev herî dawîyê di dagirkirina Kerkûk, Xaniqîn û Şingalê da hate dîtin. Lê belê, tifaqa navxweyî êrişên dijminan dişkêne û rê li ber serkevtina navxweyî vedike ku ev jî di parastin û serkevtina Kobanê da hate dîtin. Civîn, tifaqa navxweyî şertê man û nemanê dibîne û banga yekîtîya neteweyî dubare dike.
3. Divê li Kurdistanê, li derveyî welat piştevanîyeke xurt li Hêzên Parastinê bête kirin û bi germahîya parastina Kobanê, dijî dagîrkerîya dewleta Tirk ya li ser başûrê Kurdistanê bête rawestan. Bi vê armancê ve girêdayî li welat û derveyî welat, divê xebateke xurt ya dîplomasîyê ya hevgirtî, ya neteweyî û niştimanî bête kirin.
4. Civîn, li hember êrîş û dagirkerîya dewleta Tirk, banga seferberîya neteweyî û niştimanî radighîne û bang li Kurdistanîyan dike ku şev û roj bi hemî şêweyên kar û xebatê, di nava çalakîyan de cihê xwe bigrin û di tenîşta hêzên berxwedêr de rawestin.
5. Civîn, bang li Serokatî, Parlamento û Hukumeta Herêma Kurdistanê dike ku li hember van êrîş û dagirkerîya dewleta Tirk derkevin û hêzên ordîya Tirk ji başûrê Kurdistanê derxin.
6. Civîn, bang li dewleta federal ya Êraqê dike ku peymanên sînor derbazkirinê yên dewra Sadam de bi Tirkiyê re hatîn çêkirin betal bike, dijî dagîrkerîya dewleta Tirk ya li ser başûrê Kurdistanê nerazîbûna xwe diyar bike, qada hewayî ya Êraqê ji firokên şer yên dewleta Tirk re qedexe bike û ji bo derketina hêzên dewleta Tirk ji nav tixûbên dewleta federal ya Êraqê, tedbîrên pratîk bistîne.
7. Civîn, bang li Komkara Dewletên Erebî dike ku dijê êrîş û dagîrkerîya dewleta Tirk ya li ser başûrê Kurdistanê, helwest bigre û şermizar bike.
8. Civîn, bang li Neteweyên Yekbûyî, Yekîtîya Ewropa û hemî hêzên peywendîdar dike ku li hember êrîşên dewleta Tirk yên li ser gelê Kurd bê deng nemînin û helwest bigrin.
9. Civîn, bang li dostên Gelê Kurd û bi giştî cihana demokratîk û xwedî wijdan dikie û dibêje "di şerên Kobanî, Efrîn, Girê Spî û Serêkanîyê de, we helwestek baş nîşan da, hêvîya me ewe hûn wê helwesta xwe, di vî şerî de jî nîşan bidin. Pêwîstîya gelê Kurd bi pişgirtina we heye".
10. Civîn, daxwaz ji Kurdistanî û dostên Kurdistanê diki ku muameleyên aborî li gel Turkîyê nekin, turîzma Turkîyê boykot bikin.
11. Jibo xebatek hevbeş dijê êrîş û dagirkerîya dewleta Tirk bê meşandin û jibo biryarên konferansê bêne pratîkkirin, di asta jor de **"Maseyek Krîzê"** tê avakirin û ev **Mase** wê li welat û herêman kom û komîteyên xwe yên jêr ava bike.
12. Em kes û nûnerên li vê kombûnê da amade, li hember êrîş û dagirkerîya dewleta Tirk helwest digrin û xwedîderketina xwe ya Hêzên Parastinê careke din dubare dikin û dibêjin **"parastina deverên Metîna, Zap û Avaşîn, parastina hemî Kurdistanê ye, emê bi hemî imkanên xwe ve xwedî li vê berxwedanê derkevin. Herweha em heman helwestê ji hemî partî, rêxistin, sazî, kesayetên Kurdistanî û ji hemî gelê Kurdistanê jî dixwazin".**

## Şêwira Helwesta Neteweyî ya li Hember Dagirkerîya Dewleta Tirk
**15ê Gulanê 2021**